Dr Nûredîn Zaza
1919 - 1988

NEWROZ

Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo : *** Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.**
*** Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.**
*** Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya wel[êt de .**

Ji *weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê - YEKÎTÎ*
Email : Newroz95@hotmail.com

Hejmar (80) Hizîran 2008 z-2620 k Buha (15) ps

Di 51 saliya damezrandina
Yekemîn rêxistina siyasî a kurd de li Sûriyê

Roja 14-ê Hezêrana sala 1957- an , bona gelê kurd li Sûriyê rojeke dîrokî ye , ji ber ku di wê rojê de , yekemîn partiya siyasî a demokratîk di nav Kurdên Sûriyê de hatibû damezrandin û ji raya giştî re hatibû aşkerekirin . Lewre jî li ba xebatkarên siyasî yên kurd bûye bîranîneke ciyê rêz û hurmetê

Di vê sirê de , hêjay gotinê ye ku , camêrên ku di wê civîna dîrokî û berpirsiyar de , ya ku li Helebê li 14.06.1957-an beşdar bûbûn , erk û ustibariya birêvebirina siyasetê û birêxistina partiyê li destên xwe gerandibûn û hildabûn ser milên xwe , ev her heft birêz bûn: 1- Osman Sebrî. 2- Reşîd Hemo. 3- Hemîd Derwîş. 4- Mihemed Elî Xoce . 5- Xelîl Ebdela . 6- Hemze Niwêran . 7- Şewket Henan.

Dûv re kêmzêde piştî salekê , rewşenbîrê dilsoz Dr. Nûredîn Zaza , helbestvanê navdar Mile Şêxmûs Cegerxîn û hin kesayetiyên dî yên xwedî rol û cîgeh , derbazî nav rêzên partiyê dibûn , ew di nav civakê de geşdikirin û dixemilandin .

Xelkê kurd di bin kartêkirina hestê netewî de , xwe li dora vê partiyê dida hev û lê dibû xwedî , bihêviya ku , rojeke şad û bextewar bi ser wan de bê , ziman û rûmeta wan ya netewî parastî be , û ligel ereban bi wekhevî û bi hevre bijîn .

Di wan deman de – ango ji beriya 50 salî - jiyan û rewşa civaka me kurdan bi tevahî pir li şûn û paşeketî bû , ji kêmxwendin û nezaniyê de bigir , di xizanî , perîşanî û nexweşiyan re derbaz be , ta tu bigihê qirêjî û kirêtiya ew ton dijatiya navxweyî ya êl û eşîran , digel rola ocaq û olperestan ya tersî pêvajoyê….Di vê çerçewa zor dijwar de , partiya kurd karibû rê li ber xwe biqelêşe û xebata xwe bidomîne .

Bi ser de jî , pêwîste bête zanîn û ji bîr nebe ku , di wan deman de , netenê helwesta karbedestiya dewletê , lêbelê sîstema hiş û helwestên hemî partiyên siyasî yên wê hîngê , ji hebûna pirs û partiyeke kurd re li Sûriyê digotin Na û li dij bûn .

Îro roj , dem û dewran serûber hatiye guhartin , jiyan û berjewendiya xelkê me yê kurd li Sûriyê baştir hatiye **D.R.(11)**